Kurdistan
Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin
PDK-S Partiya Demokrata Kurdistan - Sûriya 1957
Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (236) | Çileya Paşîn / 1-1-2023

# «Revandina endamên PDK-S û ENKS pêngavên hewlên yekrêziya Kurdî dike armanc»



**Kurdistan**

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) daxwaza berdana 2 endamên PDK-Sê ji PYDê dike û dibêje, ev kiryar hewlên yekrêziya Kurdî dike armanc. Endamê Komîta Navendî ya PDK-Sê Hisên Silêman 28ê Berfanbarê û endamê Encûmena Herêmî ya PDK-Sê Bilind Mela Ismaîl jî 27ê berfanbarê ji nava bajarê Dêrikê yê Kurdistana Sûriyê ji aliyên ser bi Rêveberiya Xweser ve hatibûn revandin. Di vê derbarê de, Sekreteriya Giştî ya ENKSê di daxuyaniyekê de revandina 2 endamên PDK-Sê şermezar kir û ragihand, PYDê di ber revandina van endamên PDK-Sê de berpirsyar e û divê ev kiryar di zûtirîn dem de werin rawestandin. Her wiha ENKSê daxwaza azadkirina wan kir. ENKSê da zanîn ku ev pêngav hewldanên yekrêziya Kurdî dike armanc û dihêle ku zêdetir xelk ji Rojavayê Kurdistanê koçber bibin. ENKSê bang li rêxistinên mafên mirovan û dewletên ku di pirsa Sûriyê de cih digirin dike ku sînorekê ji van kiryaran re deynin. Her wiha bang li rêxistinên mafên mirovan û mirovî, raya giştî û welatên ku bi karûbarên Sûriyê re têkildar in destwerdanê bikin û sînorekê ji van binpêkirinan re deynin.

---

**Rêgiriya li serkirdeyên ENKS bi riya dergehê Sêmalka berdewam e** *Rûpel—2*

**Başbûna pêwendiyên rejîma Esed û Tirkiyê bandorê li deverên Kurdî dike** *Rûpel—3*

**Dîroka Sersalê li Kurdistana Sûriyê** *Rûpel—4*

# Rêgiriya li serkirdeyên ENKS bi riya dergehê Sêmalka berdewam e






**Kurdistan-Omer Xidir**

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) di daxuyaniyekê de ragihand, Rêveberiya PYD rê nade serkirdeyên wê di deriyê sînorî Sêmalka re derbasî Herêma Kurdistanê bibin. Emîndariya Giştî ya Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê di daxuyaniyekê de got, “Ji destpêka sala 2013na ve,

> **«PYD Sêmalka ji bo berjewedniyên xwe bikar tîne»**

serkirdayetiya Herêma Kurdistanê deriyê Pêşabûrê/ Sêmalka, li ser banga Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKSê vekir, bi armanca sivikkirina êş û azarên gelê Kurd li Sûriyê, û hemû gelên herêmê, ji ber ku xelkê herêmê ji aliyê rêjîma Sûriyê û grûpên çekdar ve di dorpêçê de bûn.” Di daxuyaniyê de hat gotin, “Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS ligel gelek aliyan hertim daxwaza parastina vî deriyê sînorî dikir, ta ku xizmeta hemû gel û pêkhateyan bike û dûrî ajandayên siyasî be.” ENKS dibêje: “Lê desthilatdarên PYDê, yên ku derî ji alîyê Sûriyê ve kontrol dikin, di çarçoveya fişarên ku li ser ENKSê ferz dike, her çarê rê nade endamên serkirdayetiya ENKSê û Bereya Aştî û Azadiyê di vê derî re derbas bibin, ev jî li dijî rêzikên mirovî yên herî bingehîn e.” ENKSê nehiştina derbasbûna endamên xwe ji derî re ji aliyê Rêveberiya PYD ve şermezar kir, di heman demê de bang li Hevpeymaniya Navdewletî û Amerîka kir ku fişarê li ser PYD û Rêveberiya Xweser bikin, ta ku sînorekê ji van binpêkirinan re deynin û derî bê cudahî bikeve xizmeta her kesî de û ta ku ji bo ajandayên xwe yên siyasî bi kar neyînin.” Deriyê Sêmalka di navbera Herêma Kurdistanê û Kurdistana Sûriyê de ye û riyeke sereke û girîng ê aborî, çûnûhatina xelkê, rêxistinên mirovî û yên ser bi Neteweyên Yekgirtî ve ye.

> **«Fişar û rêgiriya li siyasetmedaran nayê qebûlkirin»**

Li ser giringiya vê dergehê ji bo xelkê Kurdistana Sûriyê û fişarên Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD li ser çûnûhatian hem xelkê û hem siyasetmedaran Rojnameya Kurdistan nerîna welatiyan wergirt.Welatiyek wiha li ser dergehê Sêmalka dibêje, ev dergeh ji bo hemû xelkên Kurdistana Sûriyê dergehê jiyanê ye, û nabe bi ti awayî ev dergeh tevlî pirsên siyasî were kirin, û tişta di vî dergehî re derbas dibe ji bo xelkê me gelekî giring e, astengkirina derbaskirina siyasetmedaran ji aliyê rêveberiya ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD cihê şermezariyê ye, û pêwîste ev kiryar werin rawestandin, nabe ev rêveberî dergehê sînorî ji bo pirsên siyasî û berjewendiyên xwe yên partîtî bikar bîne. Welatiyekî din jî dibêjem dema Serok Barzanî biryara vekirina vî dergehê sînorî da tenê ji bo xelkê Kurdistana Sûriyê bû, ne ji bo berjewendiyên Partiya Yekîtiya Demoqratîk PYD hate vekirin, lewma pêwîste ev dergeh di xizmeta xelkê me de be û ji berjewendiyan dûr bikeve, bi rastî ev dergeh ji bo xelkê me dergehê jiyanê ye û nabe  karûbarên wê were astengkirin.

> **«Sêmalka ne milkê PYD ye»**

Ehmed Hacî jî li ser vê mijarê wiha dibêje, heger PYD destê xwe nexistiba nava karûbarê dergehê Sêmalka dê rewşa xelkê me baştir ba û rêxistinên navdewletî bêhtir alîkarî ji bo Kurdên Kurdistana Sûriyê re şandibana, lê niha ev partî her tiştekî ji box we dibe û ev yek jî dibe sedema ku ti aliyek neyê Kurdistana Sûriyê.

# Başbûna pêwendiyên rejîma Esed û Tirkiyê bandorê li deverên Kurdî dike

**Kurdistan**

Wezîrê Bergiriyê yê Tirkiyê Hulusî Akar naveroka civîna şandên Tirkiye, Sûriye û Rûsyayê ya li Mosko eşkere kir û got, wan gotûbêj li ser pêşxistina aştî û aramiya Sûriyê kirine û dê di rojên pêş de kar ji bo wê yekê Sûriyê bikin. Wezîrê Bergriya Tirkiyê Hulusî Akar bi Serokê Rêxistina Îstixbarata Neteweyî (MÎT) Hakan Fîdan re ji Enqerê çûbû Mosko paytexta Rûsya. Akar û Fîdan bi Wezîrê Berevaniyê yê Rûsyayê Sergey Şoygu, Wezîrê Berevaniyê yê Sûriyê Alî Mehmûd Ebas û serokên Federasyona Rûsyayê û Îstîxbarata Sûriyê re di civîneke sêalî de kom bûn. Piştî hevdîtina ku nêzî 2 demjimêran dewam kir û beriya ku vegere Tirkiyê Akar got: “Di civînê de me gotûbêj kir ku çi dikare were kirin ji bo baştirkirina rewşa Sûriyê û herêmê bi awayekî erênî di zûtirîn dem de, da ku aştî û aramî were dabînkirin.”Akar diyar kir ku wan nêrîn û nirxandinên Tirkiyeyê anîne ziman û guh dane nirxandinên aliyên din jî. Akar wiha axivî: “Yek ji mijarên herî girîng ên ku me di hevdîtinê de anî ziman, têkoşîna li dijî terorê bû. Me tekezî li ser wê yekê kir ku em rêzê li yekparçeyiya axa û serweriya hemû cîranên xwe bi taybet Sûriye û Iraqê digirin û armanca me tenê



şerê li dijî terorê ye û ti armanceke me ya din nîne.” Wezîrê Berevaniyê yê Tirkiyê got jî: “Me diyar kir ku armanca me ew e ku endamên rêxistinên terorê yên wekî PKK/ YPG, DAIŞ ku ji bo Sûriyê jî gef in, bêbandor bikin.”Her wiha Akar tekezî li wê yekê kir ku ji bo ewlekariya welat, netewe û sînorên wan, her çi pêwîst be dê bikin.Akar derbarê pirsa koçberên Sûrî de destnîşan kir jî, ew hewl didin ku pêşî li koçberiya ji Sûriyê ber bi Tirkiyê ve bê girtin. Akar her wiha got: “Me tekezî li ser wê yekê kir ku divê pirsgirêka Sûriyê di çarçoveya biryara 2254ê ya Encûmena Asayişa Navdewletî de bi awayekî berfireh û giştalî were çareserkirin.”Wezîrê Bergiriyê yê Tirkiyeyê Hulusî Akar Hulusî Akar herwiha diyar jî kir, dê civînên wan berdewam be.Pêwendiyên Sûriyê û Tirkiyê niha mijareke germ a rojevêve. Li ser vê mijarê şirovekarek wiha dibêje”Pêwendiyên rejîma Esed û Tikriyê nehatine qutkirin û bi vê pêngavê dê rewşa li deverên Kurdî aloztir bibe, helbet nêzîkatiya di navbera van aliyan dê Emerîka jî dilgiran bike, ji ber ku ev yek li dijî berjewendiyên Emerîka bikar tîne “

# Xebatkar Mihemed Nezîr Mustefa di bîra her Kurdekî de ye



**Kurdistan**

15 sal li ser koçadawiya xebatkar û tekoşer Mihemed Nezîr Mustefa, sekreterê berê yê Partiya demqrata Kurd li Sûriyê Elpartî ku niha bi PDK-Sê tê naskirin re derbas dibin.
Xebatkar Mihemed Nezîr Mustefa, yek ji stûnên tevgera kurdî li Kurdistana Sûriyê ye, ji Dêrika ye sala 1939an jî dayîk bûye, bi koka xwe ji malbateke welatparêz û kurperwer e, ji malbata Elî Yûnis, fermadar û şoreşgerên şoreşa Sason li Bakurê Kurdistanê ye.

Sala 1958an de, wate piştî damezirandina yekem partî bi salekê, tevlî partî bû, di şaxên partî kar û xebat kir ta gihişt komîta Navendî, piştre di yekem kongir de wate piştî kongira yekbûnê, li herêma Kurdistanê 1972an de bû endamê polîtbîroyê.
Di tebaxa 1973an de, bi hejmaek hevalên xwe di serkirdayetiya Partî de, ji ber helwesta wan di redkirina projeya kembera erebî hatin zîndanîkirin, ta 1981ê de di zîndanên man. Piştî ji zîndanê derket ji karê rêxistinî bi dûr ket, lê dema emîdarê giştî yê Parî Kemal Ehmed şehîd bû, hewl hatin kirin ku vegerînin nav karê rêxistinî, di kongira 8an de weke sekreterê komîta navendî hate hilbijartin, di ya nehan de, bû serkreterê giştî yê partî, her di kongira dehan de jî weke sekreter hate hilbijartin. Xebatkar Mihemed Nezîr Mustefa yekemîn xwendakarên Kurd bû ku ji kolêja mafnasiyê derçûye, karê xwe jî weke parêzer berdewam kir û bi destpakî û dilsoziya xwe navdar bû, her şêwrek hebe parêzerên kurd xwe lê digirtin û ji wan re bûbû lêveger. Di sala 2006an de, tûşî nexweşiya pençeşêrê bû, bi fermana serok Mesûd barzanî ji bo Fransayê hate şandin da ku çareserî jê re were kirin, piştî vegeriya jî dîsa ji aliyê hikûmeta Herêma Kurdistanê ve guhdana û şopandina rewşa wî dihat kirin. Piştî dîrokek tejî kar, xebat û danûstandineke li ser bingeha rewşt û reftarên baş û hezkirinê bi rêheval, dost û kesûkarên xwe re, di 22ê Beçileya 2008an de çû ber dilovaniya Xwdê, bi beşdarbûneke mezin ji şêniyên Rojavayê Kurdistanê bi xakê hate spartin, bi koçadawiya Mihemed Nezîr Mistefa bizava rêzgarîxwaza kurdî stûnek derda û ji dest da, lê pencemora wî û rol û xebata wî yên bi tîpên zêrîn hatine nivîsdadin her zînd dimînin nifşek pê nifşekê re berdewam dike.

# Dîroka Sersalê li Kurdistana Sûriyê



## Bidûvçûn

Sersal çalakiyek ji çalakiyên gelêrî ye, berê bi teşeyekî çalak û firehtir dihat çêkirin, nemaze, wexta jiyana mirovan tekûz bi çandin û berhemên xwezayê ve girêdayîbû. Sersal bi resenê xwe diyardeyeke olî ye, ango ji baweriya ku xwedê desthilatdarê her tiştî ye tê, û bêyî razîbûn û pesenda wî, ne pêkan e tu tişt li ser rûyê zemîn çêbibe. Heyama peydabûna vê têgînê vedigere destpêka jiyana mirovê baqil, wê çaxê mirov hêma û sembolên xwezayê wek hêzên nediyar dihesibandin, û roj ji rojê têgîna ku ew hêz mirovne jîndar in, û ji ber ku hêzeke wan a taybet heye, mirovên asan nikarin tu caran wek wan bibin peyda bû, hingê raman û têgihêştina mirovê asan navê xwedewandan li wan kir, û her hêzeke xwezayê bi xwedewandekî hat bercestekirin, her wiha xwedawendê şer, mirinê, baranê ...hwd derketin, û ji ber ku bandora wan hêzên xwezayê bi şêweyekî rasterê li mirovên asan dibû, mirovên han girift û arîşeyên neyênî ên ku bi serê wan dihatin, dispartin van xwedawendan, û ji bo xwe ji xeyd û nifirên wan biparêzên, ew hertim li pesend û razîbûna xwedawendan digeriyan, di encamê de ew têgihêştin, rêya pêşkêşkirina qurbanan, qurban jî wê çaxê hem mirov û hem jî lawir bûn, belê ji bo qurban li wargehekî taybet bên pêşkêşkirin, perestgeh jî hatin afirandin, ji hingê ve, jiyana mirov û terzên cihêreng ên vê jiyanê bi van xwedawendan ve hatin girêdan û hêj berdewam in. Bi borîna salan, herçend hiş û ramanên mirovantiyê bi pêş ketin û werar bûn jî, lê ta roja îro bandora têgîn û ramanên ku mirov cara yekemîn wergirtinbûn berdewam e, ev dîmen di civaka me kurdan de pirtir diyar e, nemaze, Kurd xwedî baweriyeke olî ne, ku ji hezar salan ve bêbirîn berdewam e, belê ew jî ola Ezdayetî ye, û digel ku piraniya Kurdan îro misliman in, lê di jiyana wan ya rojane de, dirûv û terzên ola kevin bi xurtî cihê xwe girtine û hêj digrin. Sersal jî yek ji wan fêr û dabên ku ji dema kevn de maye ye. Berê pir caran baranê xwe radigirt û nema bi salan dibariya, belê wê çaxê jiyana Kurdên Efrînê sedîsed bi çandin û berhemên xwezayê ve girêdayî bû, çi ji bo wan çi ji bo lawirên wan, û ji ber ku hemû xelkê Herêmê têkildarî vê giriftê bûn, ew bi şêweyekî hevbeş li pesend û dilovaniya xwedê digeriyan, wek çawa mirov berî hezarsalan li eynî tiştî digeriya. Libergerîna xewdê ji alî xelkê ve niha di sersalê de tê berceste kirin, armanca sereke ya xelkê ew bû ku xwedê ji wan razî bibe û barana ragirtî bi ser gemin, giya û zoznên wan de jinûve bibarîne. Teqez, wan jî dizanî ku beyî tikan, lavan û qurbanê ew tişt ne pêkan e, di encamê de meşa sersalê derket holê. Bi rahatî, meş û boneya sersalê di danê şevê de çêdibe, hingê ciwanmêrêm her gundekî li hev dicivin û dest bi meşa sersalê dikin, serekê koma ciwanmêran li defikekê dixe, saz û lîrîkên olî distirê û hemû kesê vê re dimeşin jî li pey wî lîrîkan dubare dikin, hemû sazên wan jî, tika, lava, pesnên xwedê û gazî ji mala ku li deriyê wê dixin in. Her wiha, karwana ciwanmêran mal bi malên gund digerin, û hertim bang û tikayên wan ligel defikê berz û bilin din, Xelkê gund jî, ên ku karwan diçe mala wan her kes li gor reşwa xwe ya aborî beşdarî bizavên meşê dibin, û her kes li gor taqeta xwe, savar, nîsk, nok û diravan didin karwanê, pêre, piştî ku çi ji destan tê der, xwedanê malê dê kodikek av bi ser karwanê de bireşîne, ev jî tê wateya arîşanî û razberî ku barana ragirtî wisa bi ser wan de bibare, gera karwana sersalê bi mal û sînora gund ve ne girêdayî ye, ew diçe gundên hawîdora gundê wan, û li beranberî wan jî karwanên gundên din tên gundê wan, her wiha, sersal dibe tiştekî gelemper û giştî û li hemû gundên herêmê belav dibe. Karwan di heyama hefteyekê de digere û hertim jî meş û gera xwe bi şev e, di dawiya hefteyê de, ciwanmêrêm karwanê dê bicivin û tiştê xelkê ji wan re pêşkêşkiribû, veqetînin, tiştê tê firotan dê li aliyekî bê danîn, û dirav dê li aliyekî bên danîn, pêre çend ciwanmêr dê biçin bazarê û tiştê tê firotin bikin dirav û têxin ser diravên ji sersalê komkirine, bi hemû diravan, ew ê berxekî yan jî beranekî bikirin, û bibin li ber perestgehekî bikin qurban, ango eynî serpêhatiya berî hezarsalan dubare bikin. Di boneya pêşkêşkirina qurbanê de hemû endamên beşdarî sersalê bûbûn û çend mirovên ji gund bi wan re çûne ber perestgehê, wexta ku serê berên tê jêkirin, destên xwe berve ezmên dikin û yekdeng tikan û lavan ji xwedê dikin ku baran bibare û jiyana wan jinûve şîn bike, pêre ew xwarina xwe dixwin, û goştê mayî jî li feqîr û hejaran belav dikin. Bi rastî, pir caran xwedê an jî xweza lava û tikan dibihîse, û xelkê ewqas cefa dîtiye dilşkestî nahêle, ango piştî çend rojan baran dibare û hemû jiyana wan jinûve şîn û şad dike. Lê wek her tiştekî ku kurd vê re têkildar in, Kurdên Efrînê qerf û henek jî der barî sersalê gontine. Dibêjin salekê encama gera sersalê pir berdar bû, ta wexta endamên sersalê çûne bazarê biryar dan ku beranê tev mezin bikirin, û piştî çend rojan ji pêşkêşkirina wê qurbanê, baran barî û nema sekinî, baranê wê çaxê jiyana wan şîn nekir; lê jiyana wan reş û tarî bû, çimkî mal û çandina wan tev li ber lehî û lêmiştan çû, hingê ew ji nûve çûn bazarê, û beranekî din kirin qurban, lê wê carê bo ji xwedê tikan bikin baran raweste.